

## Viyana Danezana Şamê( Îlan Dîmeşq) Nîşana berdewamiyê ye

- Memê Alan -

Piştî girtina bi dehan ji giregir û rêvebirên Danezanê , ziyangihandina berjewandiyên hinekan ,û şopandina hinekên dî , gef û gurên jê re bi rêdibûn , û bi sedan vir û vûtên ji aliyê hêzên parastinî yên rijîmê ve li ser dihatin çêkirin û belakirin. Rawestandina çend partî , hêz û kesan endamtiya xwe ji Danezanê , derketina hin kend û astengan li pêş birêvebirina wê çî li vir û çî li wir ; Hîşt tirseke rasteqîn derkeve holê û li ba gelek payda bibe , ku belkîm bivebûnek li ser jiyana û hebûna Danezanê hebe , û paşeroja wê jî bi paşeroja buhara Şamê be . Ji ber ku , tekûziyek hebû ku biryara rijîmê biryareke tunekirin û ji holêrakinê ye .

Rast e hîn ew tirs berdewam e . Lê , piştgiriya bi sedan dewlet , hêzên fermî û ne fermî , komele û komîteyên sêvîl û mafên mirovan , perleman , perlemantêr û kesên bi nav û deng , çî li hundir Sûriyê û çî li derve , bi vê çembera welatî re û bi taybetî bi girtiyan re ; û bi ser de , viyana berxwedan û berdewamiya xebatê li ba endamên wê , hîşt ew tirs li cem xelkê sivik bibe . Nimûnakên ku, viyana berdewamiyê diyar dikin ev in :

1- Danezaa Şamê di hemî bûyerên hundir û derve de xwedî helwest e .

2- Damezrandina komîteyên şaxeyî li derve , û girêdana civatên bi hev re li hundir û derve û di nav de partiya Yekîti

ya demoqrata Kurd li Sûriyê wek : Civta Landonê di navêna P.Y.D.K s , Tevgera eledalê Welbînai ( Enes Elebdê ) , û hizib eldîmoqratî elsûrî ( Mihyedîn Lazqanî ) de , civatên li pêş Waşinton û Biroksêl . digel hevdtinên bi hin dezgehên sêvîl , mafên mirovan û perleman re çêdibin .

3- Hin çalakîyên ku , Danezan pê radibe mîna seredana gora nemir Ibrahim Henano li Helebê Di 17. 4 an de .

4-Lêxwedîderketina Danezanê li biryar , helwest û nêrînên xwe , û bi taybetî erênkirina girtiyên wê ji gef û gur û tenereşandina rijîmê re di riya hin dûvçilkên wê re. Mînak: Dozkirina Rijîmê ji girtiyan - di riya dûvçilkekî xwe re bi navê avokat Muhened El-Hesenî re – ku , bêjin em ne xwediyê daxuyana civata salane ya encûmenê ya Danezanê ne( ji ber ku gelek helwestên ku, tersî berjewandiyên rijîmê tê de ne ) .

Û li hemberî wê sozdana berdana wan heye . Bersiva wan jê re , em dimînin xwediyê wê daxuyanê û em jê venagerin û tu guftûgo di navêna me û yên mîna te de çênabin .

4- Piştî gelek hevdtinan di navêna Danezanê û hin hêzên dî de û nêzîkbûna baweriyên , hêviya derbasbûna hinekan derdikeve holê .

5- Ev hêviyên çêdibin ne ji xwe berê ne , belê ew ji viyan û baweriyê xurt li ba endamên Îlanê hatiye . Ev viyan jî nîşana berdewamiyê ye

***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê  
Kurd re yên di girtûgehên Sûriyê de***